Sembol û nirxên ku bûne hegera domandina xebatê bo PDKÎ

»»» R:7



Yekitî yek ji riyên serkevtinê ye

»»» R:2

*Bidestveanîna mafên neteŵî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (459) 7-12-2023 Buha (1000) Tûmen*

Dîplomasiya dicîtal pêwîstiya niha ya tevgera neteweyî ya Kurdistanê ye

»»» R:3

Bandora siyasî-civakiya Şoreşa “Jin Jiyan Azadî” li ser civaka Îranê

»»» R:9

## EWLEHÎ YAN MAF?




Deshilata kolonyalysty li Tehranê jêveye ku dê bikare bi berfirehtirkirina bernama mûşekiye xwe û destpêregehîştina bi diron û herwisa çeka navokî, ewlehiya rejîma xwe dabîn bike û ji tirsa sernixûniyê û herifînê xelas bibe!
Her lewmaye ku hemî malvêranî û dorpêçekê qebûl dike û pêşwaziyê ji hemî siza û terîk û tenê manekê û heta biryarnamên navnetewî jî dike ku bi dijî rejîma Îranê têne danê.

Sedemekê heta digotin ku biryarnamên encumena ewlehiya navnetewî bê nirx û qîmetin û bila hinde biryarnaman der bikin heta xwe diwestînin.

Hemî ev kiryar û gotinane ji wê yekê ve çavkanî digre ku jêveye bi çeka dûrhavêj stratêjî û bi diron û mûşekan û çeka Navokî, dê bikare bibe xwedî gerentiyekê ku bikare rejîmê biparêze.

Li wê derheqê de çendîn mînakan tînin ku deshilatdarên çendîn welatan, bi ji destdana çekên xwe rejîma wan ji nav çoye. Bo mînak rejîma Qezafî li Lîbiyê, yan rejîma Beis li îraqê, yan dagîrkirina xaka ukraînê ji aliyê Rûsiyê ve, bi wan sedeman dizanin ku wan welatan çekên stratêjîk û komkuje xwe ji dest dane, lewmaye ku welatên bi qawet û mezinhêz timahî jê birine û êrîş kirine ser.

Lewma rejîma Wilayeta Feqîhî û pastarên mêjî hişke wê, hemî cehda wan eve ku çekên xwe berfirehtir bikin û heçî çekekî nû jî ku dest wan dikewe, li ser Kurdistanê diceribînin, hem Kurdistanê weke cihê ceribandinê dibînin, û hem bi çekên xwe yên komkujî dixwazin Kurdan bitirsînin. Lê ewa ku fikir jê nekirine û jê tênagehin ewaye ku, Çekên qiran û komkuj renge li şerê derekî de bête bikaranîn, lê di bûyerên navxweyî de êdî ew çekane şiyan û kartêkeriya xwe ji dest didin û bê bandor dimînin. Renge bikarin mûşek û dironan bihavêjne binkên Hizba Demokrat, xa nikare pê mûşekên balestîk li Sine, kirmaşan, Zahidan, Ehwaz, tewrêzê, yan bajarên Farsan weke Tehran û Îsfehanê bide û li desma serhildana girseyî a xelkê de, êdî çekên komkuj bê bandor dibin. Mijara duyem ku ji bîr kirine ewaye ku welatê xwedî çeka etomî weke Yekîtiya Soviyetê jî ku hebû, bi bê teqandin û bi bê evê ku bikare bi kar bîne, rejîma wê herifî û sernixûn bû. Dema ku îdolojiyek ekspayêr bû û dema rejîmek bû bargiranî bi ser xelkê û heta alîgirên xwe yên berê jî, êdî ti cure çekek nikare biparêze.

Ji pirsa bûyerên ji nişkê ve û berjewendiya klatiyan girîngtir, pirsa mafê însanî û neteweyî ye ku rejîm binpê dike û jêveye ku li pêxema mana xwe de dikare hemî çekekê bikar bîne û mafê netewan cem wê ti bihayek tunîne.

Lêbelê dema ku ewlehiya rejîmekê li ser wê hindê rawestiyabe ku xelkê dinê bê maf bike, wê demê ev ewlehiye ne tenê cihgirtî nîne, belkû dibe diyarokek bi dijî wê xwe.

Kiryar û siyasetên rejîmê dikeve nava cixîzeke devrlêdanê ku bo kîjan alî bête zivirandin, ewlehiya wê zêdetir dêxe ber metirsiyê. Rejîm bo ewlehiya xwe mûşekên zêdetir berhem tîne û dironên berfirehtir bikar tîne û ev çek çêkirin û ji nav birina sermaye û herwisa gefa ji can û jiyana netewên di nava Îranê û derve jî, wisa dike ku ji warê abûrî ve lewaztir be û xelk pitir bi dijî tepeserkaiya rejîmê helweste bigrin û bi kerb û kîntir bin û kîna pendavxwariye xelkê rejîmê zêdetir ditirsîne û lewma çeka zêdetir berhem tîne û cinayetên zêdetir diafirîne û ev yeka jî zêdetir kerbê xelkê diveke.

Bazna bê qetyana ewlehiya betale rejîmê li ser bingeha bê mafkirin û sitemkariya li ser netewên nava îranê û derve dê berdewam be, dê bileztir dervr hilgire û dîrokê daye kifşê ku li kêşmekêşa di navbera ewlehiya betale rejîmekî dîktator û daxwaziyên xelkê mafxwaz de, ewe rejîmin ku çala merg û sernixûniya ber pê yê xwe dikolin.

Gefên rejîmê bo ser kurdistanê û serdana deshilatdarên rejîmê bo Îraq û derdorê û heta diron û mûşek havêtina wan, nîşan û berjenga hatina dewranekî dinê ye, ku ev jî dewrana herfîna kolonyalyzmê ye.

# Yekitî yek ji riyên serkevtinê ye



**N: Nûredîn Sofîzade**



Kurd bi dehan sale li serdemê moderníteya xebatê de û li çarçêweya part û rêkxistin û bernameyên siyasî de ji bona bi destveanîna mafê netewiye xwe dixebite û li hember rejîmên dagîrkar de berxwe dide û li wê pêxemê de jî nirxên mezin dane.

Renge li 100 salan beriya niha doza Kurd û şoreş kirin nehatibû rêkxistinî kirin û tenê li mile Eşîrî û li pey Şêx û Axa û rêberekî Olî dikevtin û heçî dema ku wî rêberê meinewî dev ji xebatê berdaba, hêza bavirmende wî û wan kes û şoreşvanên ku pey wî kevtibûn jî, dev ji xebatê berdidan, yan dema rêberê şoreşê bi her awayekê nedima yan ji aliyê dijminan ve dihate girtin yan kuştin, dawî bi wê doz û şoreşê jî dihat.

Li ev 100 sale ku pirsa doza Kurd ji qalibê kevin derkevt û partiyên siyasî pêk hatin û xebat hate rêkxistinîkirin û armancê xebata partiyan weke Bernama siyasî hate darêtin û rêberî û sergêriya partî û şoreşên kurd ji destê kite rêberekê ve, hate guherîn bi rêberiya bi kom û encumen û navend kumite û …..

Ger em behsa Rojhilatê Kurdistanê bikin, ku xîmê doza netewî li şoreşa Simko yê Şikak de hate danîn, û zêdebarî hebûna komek kêmasî û lewaziyên di şoreşa Simko de, lê yekem car bû ku pirsa Kurd û mafê Netewî weke armanc hate pênasekirin û xwestên Kurd hatne diyarîkirin. Her lewmaye ku piştre rêberên Kurd Simkoyê Şikak weke babe nasyonalîsma Kurd pênase Kirin.

Piştî şehîdbûna Simko û têkçona şoreşa wî, mirovên xwedî hesta netewî û xebatkar ku ezmûn ji şoreşên berê vergirtibûn, dest kirne avakirina rêkxistinekê bi nave Komeleya Vejandina Kurd " K. J" û piştrejî ji bona pêşxistin û demokratîzekirina rêkxistina han, guherîn bi Hizba Demokrat a Kurdistanê.

Hizba Demokrat ku di sala 1324an ve hatiye avakirin, tevî evê ku li qonaxên dijvare xebatê de derbas bûye, lê di wan 8 dehkên temenê xwe de gelek serkevtin û şanazî tomar kirine, weke avakirina Komara Kurdistan, pêkanîna hêza Pêşmerege û danîna nave Pêşmerge, çêkirina rêkxistinekî berfirehe teşkîlatî ku hemî herêmên rojhilatê Kurdistanê bi xwe ve digre û Hizba Demokrat xwediyê pêgehekî herî bihêze cemaweriye di nava xelkê Kurdistanê de.

Wê Hizbê li pêxema pirsa netewî de nirxên mezin dane, rêberên wê cane xwe goriyê armancên gel kirine, di hemî temenê xwe de bo demekê ji xebat û berxwedanê nesekiniye.

Ger çi Hizba demokrat baveriyekî kûr bi çareseriya aştiyane a pirsa Kurd heye, lê dema dijmin bersiva daxwazên Kurd bi êrîş û kuştinê daye, Hizba Demokrat û Pêşmergên gernase wê, bi piştewaniya hertimiye xelkê Kurdistanê, gernasî kirine, û li hember hêza dijmin de berxwe dane û hemase û dastanên mezine mêrxwasî tomar kirine.

Li qada siyaset û hevxebatî û çêkirina hevalbendiya bo xebatê li asta Kurdistanê û heya seranserî Îranê jî, kar kiriye û PDKÎ li ser vê bavirê bûye ku bi bê yekîtî û hevxebatiya hêzên siyasî hem li Kurdistanê bo bi destveanîna mafê Kurd, û hem li astê Îranê bo sernixûniya rejîmê û anîne ser kare rejîmekî demokratîk, serkevtin çê nabe.

**Gava ev bavera PDKî ye û felsefa hebûna wê hizbê jî xebate bona serkevtinê û rizgarî û azadiyê û mafê netewî, aliyê kêm li nava hêz û rêkxistinên Kurdistanî de, hewceye ku hizba Demokrat wek bavera xwe hertim pêşqedem be bona çêkirina yekitî û hevxebatiyê û liserhevxistina mala Kurd. Zêdebarî hebûna gelek cudahî û vêkneçona kar û siyaset û selîqa di navbera partiyên siyasiye Rojhilatê Kurdistanê de, xu aliyê kêm li ser bingeha hin xalên hevpar û berjewendiya hevpar kar bête kirin bo hevxebatiyê.**

Hi hêzên xwedî derbasbûyî û xwedî pêgeh gorî hêza xwe li nava Kurdistanê, hene ku bikarin lihevbikin, bêguman li çend salên derbasbûyî de, hebûna Navenda Hevkarî a hizbên siyasiye Kurdistana Îranê, gelek bi bandor bû û karî deskevtên mezin bi destve bîne û dema xelkê xebatkare Kurdistanê yekitiyek li nava partiyên siyasiye xwe de didîtin, wan jî bandor jê werdigirt bo rijdbûna li ser xebatê û dilgerimtir dibû, lê me dît ku dema heya qasekê Navenda Hevkarî bi sedema hin pirsên siyasî li karê xwe de sist bû, dem û dest bandora nerênî dana ser xelkê rojhilatê Kurdistanê.

Bi kurtî xelk yekitiyê dixwaze, hevxebatî û nêzîkatiya di navbera partiyan bandora rastewxe dadinê ser xelkê û bo wan dibe cihê dilxweş û hiviyê.

Dibe ku partiyê me bandora wê yekê çi bi nerênî û çi bi erênî dîtibin û ceribandibin, lewma hindî zû bo serkevtina xebatê û digermiya xelkê şoreşvane Kurdistanê, yekitî û hevxebatî di navbera Hizbên Kurdistanê de çê be, hela direnge.

Serkevtin tenê di yekitî û hevdengiyê de ye.

Kurdan di dîroka xebata xwe de gelek dare netifaqî û yeknebûnê xwarine û hivîdarim ji wan ezimûnan dersê vergirin.

# Dîplomasiya dicîtal pêwîstiya niha ya tevgera neteweyî ya Kurdistanê ye



N: Dr.Mecîd Heqî

Dîplomasiya dîjîtal an jî dîplomasiya saybirî tê wateya pêkanîna peywendiyên navdewletî bi rêya jîngeha saybirî, derfeteke zêrîn e ku tevgera netewî ya gelê Kurd eger bi awayekî rast were bikaranîn, dikare derfetên winda yên berê telafî bike. Dîplomasiya Virtual an Siberî ya Tevgera Netewî ya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi berçavgirtina rewşa niha û guhertinên cîhanî, berçavgirtina pirsa berjewendiyên netewî û peywendiyên stratejîk ên doza Kurd bi pirsgirêkên navçeyî û navneteweyî re têkiliya bi guhertina hevsengiyê re hêza li cîhanê ji her demê zêdetir pêwîstî bi diyaloga rasterast li gel civaka navdewletî û raya giştî heye.

Rejîma Iranê û hêzên neyarên netewa Kurd xwediyê kompanî û dezgehên mezin in û tevgera neteweyî ya Kurdistanê tenê xwediyê hêzeke dilsoz, niştimanperwer û xelkê dilsoz û xwebexş e. Herçend ev şerê ne rûbirûyî ji bo dijberên tevgera neteweyî ya Kurdistanê sûdmend were dîtin jî, lê ji ber dewlemendiya civaka Kurd, bi taybetî ya dîaspora û hêzên welatparêz û ciwan, ev tevger xwedî îmkanên cihêreng e, dikare bibe xaleke bihêz a tevgerê.

Tevî pêşketina mezin a mirovatiyê û sîstemên navneteweyî, siyaseta navneteweyî nekariye gelek pirsgirêkên navneteweyî yên cîhanê ji wan şer û xwînrijandin, zilma li ser neteweyên bindest çareser bike û aştiya cîhanê pêk bîne. Herwiha dîplomasî yek ji rêyên herî guncaw ji bo çareserkirina pirsgirêkên navxweyî û navneteweyî tê dîtin. Bi pêşketina teknolojiyê re, têkiliyên navneteweyî sînorên xwe yên kevneşopî derbas kirin û êdî neteweyên bê dewlet dikarin ji her demê zêdetir bi civaka navneteweyî re têkiliyê deynin. Dîplomasî wekî amûr an tevgerek siyaseta derve tê wateya hunera rêvebirina tevgerê bi cîhana derve re ji hêla dewlet û rêxistinan ve. Dîplomasî di wateya xwe ya klasîk de ji sê stûnên sereke pêk tê: siyasî, aborî û ewlekarî. Paşê, her ku têkiliyên navneteweyî pêş ketin, stûnek din bi navê stûna çandî hat zêdekirin. Îro ev çar stûn di dîplomasiyê de rola xwe dileyizin, lê di dîplomasiyê de gelek bin- stûnên din jî bi bandor in, mînak: dîplomasiya parastinê, dîplomasiya mediayê û dîplomasiya civakî û hwd. Guherîna bilez a rewşa siyasî li cîhanê û peydabûna faktorên nû di peywendiyên neteweyî de, bûye sedem ku welat ne tenê li ser dîplomasiya kevneşopî, ku tenê peywendiyên di navbera dewletan de ye, bifikirin û faktorên din ên siyasî di peywendiyan de binirxînin. Lewma têkiliyên kevneşopî bi tena serê xwe nikarin pêdiviyên tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê ya îroyîn pêk bînin.

Bi geşepêdana teknolojiya ragihandinê û niha jî şoreşa rewşenbîriya çêkirî, ku dibe ji şoreşa torên civakî bibandortir be, jîngeha virtual ji her demê zêdetir bandor li ser peywendiyên navdewletî dike û dibe yek ji faktorên stratejîk û diyarker.

Diyardeya torên civakî ewqas bi lez mezin dibe ku her roj rûpelek nû tê zêdekirin û hemû aliyên jiyana mirovan vedihewîne. Ev cure dîplomasiya paşerojê ye, ku ji hêla nifşa îroyîn, Nifşa Z, û nifşê din, Nifşa Alpha ve tê temsîl kirin. Dîplomasiya serketî ew e ku bikare amûrên nû herî baş bikar bîne û meydaneke din a şer ji bo neteweya Kurd veke. Pêwîstiya me bi dîplomasiyeke serkeftî û bibandor heye ku bikare li gorî pêwîstiyên niha yên tevgera neteweyî ya gelê Kurd û guhertinên derdora siyasî li herêmê, armancên netewî yên gelê Kurd bi pêş ve bibe. Tiştek ku tenê bi karanîna nûjen a teknolojiya têkiliyên gelemperî û nûjeniya agahdariyê dikare were bidestxistin.

Têgihîştina dîplomasiya saybirî ji bo tevgera neteweyî ya Kurdistanê kêşeyeke stratejîk e û bêyî têgihîştina cîhana nû û taybetmendiyên nifşa îroyîn, dibe ku em careke din derfetên dîrokî ji dest bidin.

Mantiqa dîplomasiya saybirî mantiqeke sê-alî ye: bidestxistina bawerî û liv û tevgera li ser pêla raya giştî ji bo bidestxistina berjewendiyên neteweyî; Dîplomasiya saybirî a gel û perwerdehiya çavkaniyên



mirovî li qadê.

Asta ragihandina saybirî gelek berfireh e û her ferdek li cîhanê dikare wekî balyozê pirsa xwe ya netewî tevbigere. Lewma dîplomasiya saybirî dikare ji bo tevgera neteweyî bibe çavkaniya hêzê. Ji perspektîfa Joseph Nye; Ramanwerê siyasî yê Amerîkî û bavê hêza nerm, hêz tê wateya şiyana bandorkirina li ser tevgera kesên din bi vî rengî ku tiştê ku em dixwazin pêk were. Bi gotinek din, hêz tê wateya bandorkirina tevgera kesên din da ku bigihîje encamên xwestî.

Di vê pênaseyê de desthilatdarî li ser du beşan hatiye dabeşkirin: hêza nerm tê wateya nirx, çand, siyaset, saziyên sivîl û neteweyî, danîna pêşaniyan û kişandina balê û hêza hişk tê wateya hêza leşkerî û aborî. Li gorî vê yekê, qada saybirî amûra hêza nerm e û hêza nerm jî di qada virtual de çavkaniya nûbûnê ye.

Li gorî Manuel Castel, dahênerê teoriya hêza rêhesinê, di cîhana rêhesinê de çar formên hêzê hene: 1. Hêza saz kirina toran. 2. Hêza toran. 4. Hêza saz kirina tor û pêwendiyan. Hêz û grûbên ku xwe gihandine teknolojiya nû ya ragihandinê û bi çawaniya bikaranîna wê dizanin, xwedî hêza kontrolkirina danûstandinan in. Ger van hêzan xwedî têkiliyên saybirî ên bihêz bin, ew dikarin wêneyek çêtir ji xwe re nîşanî cîhanê bidin. Lewma hêza cîhanî ya her rêxistinekê girêdayî şiyana dîplomasî ya medyayê û peywendiyên wê ye, ji ber wê jî tevgereke neteweyî û hêzên Kurdistanî pêwîstî bi siyaseteke navdewletî ya netewî heye ku bi hev re bi awayekî serkeftî bi awayekî dîplomatîk pirsgirêka Kurd bike mijara civaka navdewletî.

**Derfetên dîplomasiya dîjîtal**

Dîplomasiya saybirî van derfetan ji tevgera neteweyî ya Kurdistanê re diafirîne:

Têkiliya bi curbecur elît û şopînerên gerdûnî re hêsan bikin, karûbar û prosedurên dîplomatîk bilezînin, û bi lêçûnek kêm beşdarî bûyerên dîplomatîk ên virtual bibin.

Bi berçavgirtina rewşa niha ya têkoşîna li Rojhilatê Kurdistanê û serkirdayetiya partiyên siyasî yên Kurd bi sedema peywendiyên Îran û Iraqê, dîplomasiya saybirî derfeteke zêrîn e ji bo girêdana bi saziyên din ên navneteweyî re, ku berê nedihatin zanîn ji ber peywendiyên yekalî. partiyan.

Yek ji taybetmendiyên projeyên dîplomatîk, bi taybetî nûnerên partiyên siyasî, şopandin, şîrovekirin û naskirina geşedanên cîhanê ye da ku bi têgihiştinek rast gavên xwe yên dîplomatîk bavêjin. Ew derfetek e ku meriv çawa bi cîhanê re têkilî daynin û berjewendiyên hevpar bibînin. .

## Gef

Jîngeha virtual ji hêla bilez û hêsaniya ragihandinê ve tête diyar kirin. Komara Îslamî ya Îranê û dijberên bizava neteweyî bi rêya sazî û kirêgirtiyên xwe dikarin bi rêya terorîzma saybirî bibin metirsî li ser dîplomasiya virtual ya tevgera Kurdistanê.

Manîpulasyon, dizîna agahiyan û guhertina rastiyan bi îstîxbarata çêkirî metirsiyeke din e li ser tevgera neteweyî ya Kurd.

Li gorî nivîskar, ji bo ku îmkanên dîplomasiya virtual bi bandor bikar bînin, divê hêzên kurd bi hevkariya rêxistinên civaka sivîl ên li derve, pispor û elîtên kurd ên li dîasporayê platformek neteweyî ya hevpar ava bikin, ji bo ku stratejiya dîplomasiya saybirî aqilmend were çêkirin û rêvebirin. lihevkirinên pêwîst, hemahengî û dabeşkirina erkan di çarçoveya berjewendiyên neteweyî de û bihêzkirina hevkarî û têgihîştina neteweyî di pêwendiyên navdewletî de.

# Pêşmergebûn, dema ku meriv hebûna xwe pênase dike



**N: Serbest Urmiye**

Wateya bingehîn ji bo têgeha şûnas'ê, "kê bûn"e, ku weke hewcehiya xwezayî di xwe nasandina merivan de tê hesibandin. Hewcehiyek ku dibe sedema têr kirin û geşekirina hestên mirov di nava civaka mirovahiyê de û bi kurtî wate faktera selimandina hebûna mirov. Ji ber ku xwenasîn di warên giştî û hevbeş de, şunasa mirovî, takekesî û neteweyî ya merivan pênase dike.

Bi giştî şûnas di sê astan de tê şirovekirin: takekesî, civakî û neteweyî ku şûnasa neteweyî di asta herî bilind a pêvajoya şûnasxwaziyê de hatiye şirovekirin. Bi bawera, civaknasê Berîtaniyayî"Anthony D. Smith", şûnasa neteweyî tê wateya ji nû ve şîrovekirina wan nirx, hêma, dîrok, efsane û kevneşopan ku weke mîrat û hegera hermana neteweyan tên zanîn. Li gor vê baweriyê, di dîrok, efsane û derûnnasiya her neteweyekê de komek hêma yan sembol hene ku di dema ji nû ve şirovekirina şûnasa neteweyî de xwedî rol û bandor in. Sembolên han bi veguhastina wate û têgehên hevpar di qonaxên cuda de, rolê mirov di peywendî û li hevgirêdana mirov û civakê de didin xuyakirin. Ew di asteke berfireh de bi li hevgirêdana astên şûnasa takekesî û civakî, derfetê ji bo berfirehtirkirina şûnasa neteweyî pêktînin. Di nêrîna fîlsofê Firansî "Henri Bergson", de nifşeke însiyatîv in di civakê de ku di hizra mirov de dimînin û mirov û civakê bi hev re girê didin, hewceye ji bo ku sîstema jiyana civakî ji metirsiya hilweşiyanê rizgar bibe.

Yek ji taybetmendiyên herî bilind ên ku bihayeke zêdetir dide sembolekê, eva ye ku civak vê weke otopiya bo cîhaneke mezintir dişopîne. Di Kurdistanê de jî, di pêvajoya şûnasxwaziyê de çi weke tak û civak û çi weke netewe, hejmarek ji wan sembol û hêmayan hene ku mirov dikare



Pêşmerge weke yek ji wan sembolan nemaze di warê nasnameyê de pênase bike. Rizgarî û serbestiya neteweyî weke otopiyayekê ji gelê Kurd re, di rol û xebata Pêşmerge de tê dîtin û şopandin. Di rastiyê de ji sembolan weke hewlekê ji bo derbasbûn ji nasnameya takekesî û gihîştin bi nasnameyeke bilindtir, wate nasnameya neteweyî, mifah tê wergirtin. Di vir jî xebata pêşmerge di serkevtin û peydakirina şûnasa neteweyî de bandora xwe dibîne. Li gor gotinên han mirov dikare Pêşmerge ji ber rol û bandorekê ku di warê nasnameya takekesî û derbasbûn bo nasnameya neteweyî de heye, weke sembol şirove bike:

Şûnas bi wateya "kê bûn"ê, di rastî de bersivdana bi zanebûn a komek pirsan e ku ji take a mirov re destpê dike û di qat û qonaxên cur bi cur ên dîrokî û civakî de derbas dibe û di herî dawiyê de digihîje asta neteweyî. Dema ku mirovê Kurd li bersiva pirsiyara li dor kê bûna Pêşmerge digere, rol û bandora Pêşmerge di tev qonaxên dîrokê û di parastina gel û nîştimanê de, destanên mêrxwazî û serkevtinên Pêşmerge bi ser dijminan de, rolê Pêşmerge di warê li hevgirêdana astên şûnasa mirovê Kurd de û afirandina şûnasa neteweyî bo takê Kurd, hêmayekê di hizra mirov de dinexşînin ku hest bi şanazaiyê bike.

Lewma di dema ku pirsa şûnasxwaziya neteweyî ser dikeve û netewexwazî ku hilgirê komek ji sembolên neteweyî weke ala, sirûdên neteweyî, wêje, helbest, rêûresm û cejnên pirr reng ên neteweyî ye, derkeve û dibe bizaveke xelkî, Pêşmerge di pêvajoya netewexweziya Kurdî de netenê weke sembol, belkû weke parêzerê nasnameya neweteweyî jî hatiye pênasekirin. Di wêje, sirûdên neteweyî û nîştimanî de rengvedaye û roja taybetî di rojjimêra neteweyî de bo rêzgirtin ji Pêşmerge hatiye pesend û diyarîkirin.

Di qada neteweyî de, Cangorîtî û mêrxwaziya Pêşmerge di warên cuda cuda yên têkoşîna siyasî, civakî, çandî û berevaniyê de û her wiha parastina hizra netewexwazî û sembolên neteweyî yên wek ala û sirûda "Ey Reqîb"de, pileyeke bilindtir di hizra gel de ji bo Pêşmerge misoger kiriye û Pêşmerge bûye cihê baweriya gel. weke qehremaneke xûya di parastina welat û tekoşîna li hember rejîmên herî hov yên serdem de tê naskirin. Di qada cîhanî de jî ketiye ser zimanê gelên cîhanê û weke leheng, têkoşer û mafparêzekê tê naskirin.



# Berxwedan jiyan e



**N: Elî Munezemî**




Li çend rojên derbasbûyî de li Rojhilata Kurdistên du bûyerên watedar qevimîn ku bûne sedema helwêstên erênî û neyînî cem xelkê û li ser torên civakî hatin nîqaşkirin.

Bûyera yekem ewa bû ku piştî hunermedn Tahir Xelîlî çû ser dilovaniya xwe, komek ji hunermend û nivîsakarên Rojilatê Kurdistanê bo derbirîna hest û soza xwe bo wefata wî hunermendî, strana wî ya bi nav û deng a «Li qendîlî serberzeve» ku stranek şoreşvanî bû, gotin û ew karê wan digel pêşvazîyek bêhempa a xelkên welatparêz û netewehez rûberû bû.

Piştre rejîma dagîrkera Komara Îslamî a Îranê, ew hunermend û nivîskar xistin bin givaşê û parek ji wan nejdil marşa «ey Îran» ku marşekn şovînîstî a neteweya serdest e, bi hilkevta heftîya «besîc» ku hêzek terorîst û parzvanê hikûmeta dagîrker a Îranê ye, gotin.

Gotina wê marşê ji aliyê wan hunermendan ve bû sedem ku du helwestên dijber bikevne rojevê ku li hêlekê xelkê ew yeka bi teslîmbûn şirove kir û li hêlek din ve jî, hindek kesa ew yeka ku li bin givaşa rejîmê de pêk hatibû, bi mecbûrî dizanîn û digotin ku nabe ew hunermend li ber wî karî bêne lomekirin.

Em bi her awayekê li wan helwestan binihêrin, bo zelalbûna wê rewşê me pêdivî bi berçavkên zanstî ên derheq kultûr û çanda kurdî heye. Xwendina kultûran girêdayî bi zanistên civaknasî û antropolojîyê e.

Awaya nihêrîna me li çand û kultûrê dikare bide eyankirin ka çawa paşxaneya çandî dikare bandorê li ser lêkolînên bûyerên jorîn me bas lê kirî, dabinê.

### Têgeha ravekar a kultûrê:

Lêkoler û zanistvanê wê meydanê hevhizr in ku «Çand dikare girêdayî be bi gel an komekê ve ku xwediyê hin taybetmendiyên hevpar in ku li ser bihorîyê ava dibin û hêdî hêdî guhertin li ser de tê.» Eger em qebûl bikin ku nirxên çandî û kultûrî ewan buha û nirxan ji xwe digre ku rasterêya jiyanê bo meriv destnîşan dikin û didin eyankirin ka kîjan armanc li jiyanê de dibe bo meriv girîng û esas be, di kultûra kurdan de her tim girîngiyek xasmanî dane wan kesan ku li hember neyar û dijminan de berxwe didin û serê xwe li hember wan de natevînin.

Bes li gor têgeha ravekar a kultûrî, ew kesên ku teslîmê xastikên karbidestên dagîrkerên Îranê dibin, kesayetîya wan dikeve bin pirsyarê û xûya dibe ku ewan berevajiyê nirxên kultûrî ên kurdan tevgeriyan e û bes karê wan nikare karek dirûst be.

Bes berevanî an rewakirina karê yên serê xwe tevandî, di xizmeta hereket û bizava kurdî de nîn e.

Kultûr û çand "her tiştê ku em li ser rast û xelet, xirab û xweşik, bikêr û bêkêr, li ser tevgera rojane û wateya jiyanê fêr dibin" e û li nifşekê ve bi hindek guhertinên kêm, derbasî nifşek din dibe. Eger hindek kes cehdê bikin nirxa «berxwedanê» bigerin û li şûna wê de nirxa «serşoriyê» deynên, ew guhertin hinde xurt e ku nikare cihê xwe bigre. Li ber ku ew yek nikare xizmeta civak û berjevendiyên netewî bike, bi tekezî xelik nikare wê guhertinê bipejirîne.

### Têgîna bingehîn û cewherî a çandê:

Her çandek xwediyê cewher û esasê xwe ye û ew yeka jî dibe sedem ku cihêrengiya çand û kultûran li komekê bo komek din biguhere.

Lê ewa ku cewhera kultûrê û nirxeke girîng li cem parek li neteweyekê tewî parek din li hemen neteweyê cihê be, ewa hindek zehmet e.

Eger em esas û cewhera kultûra kurdî li ber çav bigrin, dibînin ku nirxwa «berxwedanê» li destanên jiyana sedan leheng û rêberên kurd de wek stran, serpêhatî û destanên xweşmêriyê hatine wehûnandin û çand û edebiyatek bilind û giran afirandiye.

Eger nirxa «serşorî» bike dewsa wê de, nikare wê dewsê tijî bike, ne tenê nikare, belkî tam berwajî, yê bibe sedemê sivakbûna wê çand û kultûrê.

### Bes ya rast kîjane?

Ewa ku dijminên kurdan li her rêyeke nemerivane mifahê werdigrin bo ku bikarin kesayetî û kerameta takên kurd bişkênin, şik û guman tê de nîn e.

Ewa ku rejîma komara Îslamî a Îranê ji bikaranîna hemû amûr û rêyên dûr ji merivahiyê, ser karwanê hemû wan dijminan e, ew jî cihê şik û gumanê nîn e.

Totalîtarîzma rejîmê gefek mezin e li her takek kurd û dikare wan bibe aliyê nemanê ve.

Bes ewa ku rejîm bi wan cinayet û amûran dikare serê hindek kesan şor bike, ew pirsgirêk nîn e û dikare were famkirin.

Lê ewa ku cihê dax û keserê e, ewaye ku hindek kes dixwazin wê yekê rewa bikin û bi wê rêyê dixwazin nirxên me yên çandî berewajî bikin.

Ew yeka li kesê nayê qebûl kirin. Em hemû bi hev re wan karên qirêj yên rejîmê şermezar dikin, dijberîya wan kesan jî nakin ku nekarîn xwe rabigrin û wan palpêvenadin bo aliyê dijmin, lê berevaniyê jî li wî karî nakin ku dibe sedem kultûra me ya berxwedana bo azadî, mafê netewî û wekheviyê jar û lawaz bike.

Hindek caran di jiyana mirovan de hindek demên kurt hene ku bi hezaran jiyanan tîne.

Li ber hindê jî carek din bi dengek bilind dibêjim: «berxwedan jiyan e».

# Gendeliya sîstematîk li Îranê



N: Bêhzad Simko




Rejîma Îranê li nav 185 welatên cihanê de li rêza 147 a gendeliya malî li tenîşta Oganda û Efxanistanê de ye bi gendeliyên wiha û talankirina dahata xelkê û hemû darayîya Îranê, bi tenê derkevteke wî dirafî tê dîtin, mencek ji diraf bo girûp û milîsên terorîstî wek Hizbullah, Hemas, Hûsiyên Yemenê û Heşda Şeibî û çendîdin girûp û milîsên ser bi rejîma Îranê. Ku encama vê jinavçon û iflasa yekcarî ya aborioya Îranê û geşe bi terorîzm û tundûtîjî li cîhanê ye.

Gendeliya sîstematîk li Îranê sîstema birêvebr a rejîma Îranê li ser binyata gendeliya sîstematîk û rantê hatiye avakirin û di cihê pêşvebirina aboriya Îranê bûye sedema kombûna diraf li hinek cihan ku bo armancên taybet ên siyasî-terorîstî têne xerckirin, yan taqim û girûpeke ser bi rejîma Îranê wî dirafî xerc dike.


Wek mînakeke nû, gendeliya 3 milyard û 370 milyon Dolarî ya kompaniyekê ku pêka ragihandinên ser bi rejîmê, kompaniyeke malbatî ya bi navê "DEBSH" hatiye eşkerekirin û saziya çavdêriya Îranê anku "bazresiya Kişwerî" ya Îranê ew yeka aşkera kiriye, lê ji aliyê din ve serkomarê rejîma Îranê "Îbrahîm Reîsî" xwe bi eşkerekerê vê gendeliyê dizane, bêşermiya wê rejîmê bi qasekî zêde ye ku tevî ji vê gendeliyê ti şermekê nakin vê gendeliya hikûmî bi serkomarê berê yê Îranê ve girê didin,her çi qas ku "Hesen Rohanî" yek ji mohreyên rejîmê bo gendeliya sîstematîk bûye, bi xemsariyê tawanbar dikin.

Ew yeka li halekê de ye ku berpirsên niha yên rejîmê li serdema Rûhanî de jî berpirsayê bingehîn ên alîkarîdan bo wan gendeliyan bûne û li vê mijarê de jî berpirsên peywendîdar bûne.
Hewce ye ku şiroveyek ji gendeliya 3 milyard û 370 milyon dolarî bikin.
Her salê li navbera 50 heta 60 hezar ton Ça ya hewcehiya xelkê Îranê divê bête dabîn dikirin, lê li sala 1401ê ve bi nişkêve ew rêjeye heta 110 hezar ton tê bilindkirin û ya ecêbtir jî ev e ku ti saziyeke hikûmî û çavdêrî, ti lêkolîn an basekê li derheq vê mijarê de nekiriye.
Ji aliyê din ve %70 a Ça ya Îranê ji derveyî Îranê tê dabînkirin û cihê lêhûrbûnê ev yeka ye ku zêdetir ji %70 a hawirdeya çayê bo Îranê ji aliyê kompaniyek a bi navê "DEBSH", tê anîn ku yekek din ji rant û gendeliya sîstematîk a rejîmê dide xuya ku li navbera zêdetir ji 100 hawirdekerê Çayê, zêdetir ji %70 a vê bi kompaniyekê bi tenê bidin.
Ew kompaniye bi rêya projeyek a çandina derveyî sînoran, li welatê Kênyayê de çayê berhem tîne û pêka belgeyên ku li wezareya werzêriya Îranê, saziya Xwarin û Dermanên Îranê, wezareta "pîşe, kangeh û ticaret" a Îranê û banka navendî" ew kompaniye bi dolarên bi nirxa erzan anku "Erzê Nîmayî" çaya pile yek a Hindistanê bo Îranê hawirde bike, lê dema hawirdekirina ça bo Îranê, tevahiya wan îdare û wezaretên peywendîdar agehdarê kalîte û cura vê çayê bûne, ya ecêb ew yeka ye ku kompaniya binav malbatî ya "DEBSH" di cihê çaya pile yek ku nirxa vê li bazaran de zêdetir ji 14 Dolarî ye, çaya pile 2 a kênya ku nirxa vê li bazaran de kêmtir ji 2 dolarî ye, bo Îranê hawirde kiriye û wek çaya pile yek a Hindistanê firotiye.
Dema ku mirov cudatiya wan nirxan dibûne û bi berçavgirtina zêdetir ji 110 hezar ton ça li salê de ku bo Îranê hawirde kirine, reqem û hejmareke gelek zêde tê berçav , reqemek wek 3 milyard û 370 milyon dolar. Li halekê ku piraniya xelkê Îranê nanê şewê nînin.
Pêka gotina ragihandinên ser bi rejîma Îranê kompaniya "DEBSH" ew dolarên ku bi nirxa kêm ji banka navendî vergirtiye, li bazara azad de bê ti pirsgirêkekê firotiye, ji aliyek dana dirafek wiha zêde bê lêkolîn û çavdêrî û rêxweşkirina dezgehên ewlehî û birêveberiyê rejîmê bi ti kesekê heta kompaniyeke gelek mezin jî, nayê dan û ji aliyek din ve ew dolar bê ti pirsgirêkek li bazara azad a Îranê de hatiye firotin û ti aliyeke peywendîdar a rejîmê li vê derheqê de lêkolîn nekiriye.
Li vê derheqê de endamekî odeya bazirganî ya Tehranê jî gotiye ku dana dirafek wiha zêde bê alîkarîdan û hevahengiya berfireh û vergirtina derfetnameya taybet û erêkirina berpirsên payebilkind ên Îranê, ti îmkanek nîne û heta firotina dirafek hinde zêde bi Dolar li bazara Azad de bê ti toreke berfireh ti îmkanek nîne û li vê gendeliya 3 milyard û 370 milyon dolarîê de tevî şikandina rêkord û sînorên gendeliyê, sinorên hevkarîkirinê bo gendeliyê jî hatiye şikandin.
Pêka raporên belavbûyî li ragihandinên ser bi rejîmê, destpêka vê gendeliyê ji sala 1398ê ve bûye û beşek ji desthitdarên rejîmê ku li vê demê de jî desthiladrên paye bilind bûne, kabîneya "Hesen Rohanî" û xudî Hesen Rohanî, bi tawanbar û xemsar didin nasandin, Îbrahîm Reîsî ku xwe wek aşkirakerê vê gendeliyê dide nasandin an saziya lêkolîn anku bazresiya kişwerî ew gendeliye aşkira kirine li dema serkomariya Hesen Rohanî de pile û payeyên wan hebûne, vê demê Îbrahîm Reîsî, serokê dezgeha dad a rejîmê bûye, û serokê niha yê ofîsa taybet a serkomarê Îranê, vê demê serokê saziya lêkolîn anku Bazresiya Kişwerî bûye.

Gendelî bi qasekê berfireh bûye ku heta rapora "Bazresiyê Kişwer û sazî û dezgehên din û heta axaftinên serkomarê çewtekar ê rejîmê "Îbrahîm Reîsî" jî bi serrastî û rohnî, tevahiya aliyên vê gendeliyê eşkre nakin.
Bi berçavgirtina rewşa îro ya xelkê Îranê ku piraniya xelkê li jêr hêla hejariya tevav de ne û bi 10an milyon kes li îranê nanê şevê dest nakeve, gendeliya 3 milyard û 370 milyon dolarî reqemek gelek mezin e.

Rejîma Îranê li nav 185 welatên cihanê de li rêza 147 a gendeliya malî li tenîşta Oganda û Efxanistanê de ye bi gendeliyên wiha û talankirina dahata xelkê û hemû darayîya Îranê, bi tenê derkevteke wî dirafî tê dîtin, mencek ji diraf bo girûp û milîsên terorîstî wek Hizbullah, Hemas, Hûsiyên Yemenê û Heşda Şeibî û çendîdin girûp û milîsên ser bi rejîma Îranê. Ku encama vê jinavçon û iflasa yekcarî ya aborioya Îranê û geşe bi terorîzm û tundûtîjî li cîhanê ye.

## Nerîna Lîderan



**“Joe Biden”:**

“Cêo Baydên Serkomarê Amerîka: Ger Ukrayîn bi sedema nedana alîkariya Amerîka û bi hegera erênekirina Kongirê, rastî şikestê be, wê demê egera êrîşa miskovê bo ser Ukrayînê heye û Amerîka jî dê wê dem rastewxwe bikeve nava şer de.”



**“Yûav galant”:**

“Yûav galant Wezîrê Berevaniya Îsraîl: Emê hemî hêza xwe û bitaybet hêza leşkerî bikar bînin ji bona paşvekêşîpêkirina Hizbullaha Lubnanê bo heya paşte dizivire bo çemê Lîtanî .”



**“Can Kêrbî” :**

**“**Can Kêrbî, hewahengîkere peywendiyên şêwra ewlehiya netewî li Koçka Sipî de:Amerîka gelek bi hûrî zêrevaniya peywendiya Rûsiyê û rejîma Îranê dike û ji alîkariya leşkeriye wan li Rojhilata nawîn nîgerane**”**



**“Yûşka Fîşêr”:**

**“**Yûşka Fîşêr Siyasetmedarê Hizba Kesk a Alman: Guhertin bi ser cîhanê de hatiye û hewceye ku Ewrûpa xwe bi çeka etomî teyar bike û Îsraîl jî ku çeka Etomî heye, mafê wê ye ku li hember heçî gefekê de berevaniyê ji xwe bike”.

## Sembol û nirxên ku bûne hegera domandina xebatê bo PDKÎ



**N. Eskender Ceiferî**



Roja Pêşmergeyên Kurdistanê ye. 26’ê Sermawezê heman roj e ku ji bo Kurdan bûye dîrokeke pir şanazî.

Roja 22’ê Kanûna Paşîn a sala 1946’an a Zayînî anku 2’ê Rêbendanê ya sala 1324’an a Rojî, Komara Kurdistanê ji aliyê Qazî Mihemed ve li meydana Çarçira li bajarê Mehabadê yê Rojhilatê Kurdistanê hate ragihandin û wê hikûmeta Kurdî, ala netewî ya Kurdistanê hilda. Di vê rêûresmê de Qazî Mihemed wiha sûnd xwar: “Bi mezinatiya Xwedê, rûmeta Qurana Kerîm û li ser welat û ala xwe sûndê diwxem heta dilopa dawî ya xwîna min û nefesa min a dawiyê, bi can û malê xwe, di rêya azadiyê de, ji bo ku alên me li esmanan pêl bidin, ezê xebatê bikim.”

Niha li Kurdistanê piştî nêzîkî 80 salan, bi berdewamiya şoreşa Jînayê, heman deng li dijî dagirkariya Tehranê tê hildan. Dengê mafxwaziya Kurdan û dengê Komara Kurdistanê tê bihîstin.

Komar, ji aliyê heman partiyê ve hate avakirin ku niha jî piştî vê dîroka dirêj, hîn di xebatê de berdewam e û bûyê cihê şanaziya Kurdan.

Beriya wê jî li vê nawçeyê serhildanên Şêx Ubeydullayê Nehrî û Simkoyê Şikak çê bibûn.

Piştî ku sala 1941’ê Şahê Farsan, Riza Şah bi derbeyekê ket û kurê wî Mihemedriza bû desthilatdarê rejîmê, wê demê serok eşîrên Kurdan ên ku ji Kurdistanê hatibûn dûrxistin , zivirîn Kurdistanê û hewl didan desthilat û rêveberiya navçeyên xwe bi dest bigirin.

Êdî rojavayê Îranê ketibû bin desthilata Kurd û Azerbaycaniyan de û Rûsiye jî derbasî nawçeyê bibûn.

Sala 1942’an li Mehabadê kovara bi navê Nîştiman bi beşdarbûna 11 kesan hate weşandin û weke rojnameya fermî ya Komeley Jiyanewey Kurd (Komeley J.K) hate binavkirin û li ser hesta netewî ya Kurdan kar dikir. Navê vê komeleyê dihate wateya vejandina Kurdan. Piştî sê salan di sala 1945’an de bi pêşengiya Qazî Mihemed, Komeleyê dewsa xwe da Hizba Demokrat a Kurdistanê û daxwazên vê partiyê, xweserî, perwerdeya bi zimanê dayîkê, fermîbûna zimanê Kurdî û gelek xwestekên din jî bûn.

Ji bilî Komara Agirî li Bakur û hikûmeta Şex Mehmûd Berzencî ku li Silêmaniyê hatibû ragihandin, Komara Kurdistanê jî di warê dewletbûnê de ji bo Kurdan bû ezmûneke din. Kurdan êdî ji xwe re şoreşên Agirî, Simko û yên din kiribûn mînak û waneya berxwedanê ji wan hîn bibûn.

Piştî ku di 22’ê Kanûna Paşîn a1946’an Komara Kurdistanê hate ragihandin, Leşkerê Kurdistanê anku Artêşa Kurdistanê hate avakirin ku heman Hêza Pêşmerge bû. Ew hêz ji hezaran gencên Kurd û ji leşker û hêzên wan eşîran pêk dihat ku tevlî Komara Kurdistanê bibûn û her du hêzên siwar û peya lixwe digirtin.

Komara Kurdistanê ya ku li Mehabadê bi Serkomariya Qazî Mihemed hate ragihandin, çarde wezîr jî lixwe digirtin ku ev in: Serokwezîr: Hacî Baba Şêx, Wezîrê Karûbarên Navxwe: Mihemed Emîn Muînî, Wezîrê Karûbarên Derve: Ebdulrehman Îlxanîzade, Wezîrê Şer û Parastinê: Seyf Qazî, Wezîrê Darayiyê, Ehmed Êlahî, Wezîrê Dadê, Mela Husên Mecdî, Wezîrê Rêûbanan, Îsmaîl Îlxanîzade, Wezîrê Ragihandinê, Sidîq Heyderî, Wezîrê Post, Telefon û Telegrafê, Kerîm Ehmedeyn, Wezîrê Perwerdehî û Fêrkirinê, Menaf Kerîmî, Wezîrê Kar, Xelîl Xûsrevî, Wezîrê Ticaret û Bazirganiyê, Hecî Mistefa Dawûdî, Wezîrê Tenduristiyê, Seyîd Mihemed Eyûbiyan, Wezîrê Çandiniyê, Mehmûd Welîzade. Wan wezîran, yasaya Komarê zelal kirin.

Di dema 11 mehên temenê Komara Kurdistanê de gelek rêxistinên aborî, leşkerî, civakî, sîstema perwerdehiyê, çandî, wêjeyî, hunerî, şanoya Kurdî, saziyên ji bo parastina mafên jinan jî hatin pêkanîn, çapemenî hebûn û zimanê Kurdî jî bû zimanê fermî. Ev berhem û gelek berhemên din û herwisa Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê PDKÎ, ji mîratên Komara Kurdistanê ne ku heya îro jî li dijî dagirker xebatê dike.

Aboriya Komara Kurdistanê li ser bac û ticaretê birêve diço bi rengekî ku komîsyonekê li navendên bajaran bac ji tacir û bazirganan distand û komîsyonekê jî di rêya axayan re baca gundewaran kom dikir. Herwisa Komara Kurdistanê bixwe jî çalakiyê bazirganî û ticaret dikir ji bo ku dahata pêwîst ji bo xercên hikûmetê bi dest xwe ve bîne.

Hêzên Rejîma Şahê Farsan, bi desteka Berîtanyayê di roja 17’ê Kanûna 1946’an de, leşkerên xwe birin aliyê Kurdistanê. Ji bo ku xelk neyê komkujkirin, Qazî Mihemed, berdewamkirina riya xwe, sparte hevalên xwe û êdî komar hate hilweşandin û Qazî Mihemed xwe radest kir.


Ji bilî desteka Berîtanya, Sovyetê jî bi Îranê re lihev kiribûn ku peywendiyên wan ên aborî bi rejîma Şahê Farsan re berdewam bikin û di lihevhatina wan de hatibû destnîşankirin ku “Mijarên Azerbaycan û Kurdistanê, pirsgirêkên navxwe ne û Îran divê bixwe, van pirsgirêkan çareser bike û êdî Sovyet piştgiriyê nade van neyarên Îranê. Herwisa êdî hêzên Sovyetê û ên Berîtanya jî, ji axa Îranê bi temamî vedikişiyan.”

Di roja 31’ê Adarê a sala 1947’an a Zayînî de Qazî Mihemed serkomarê Kurdistanê, Seyf Qazî wezîrê Şer û Parastinê yê Komarê û birayê wî Sedr Qazî li meydana Çarçira ya Mehabadê hatin darvekirin lê rêbaz û çepera wan, heya niha jî her didome û bûye şanaziya Kurdan.

Piştî nêzî 80 salan, dunya hatiye guhertin. Lê tişta ku qet nayê guhertin, dengê şoreş û serhildana Kurdan li dijî dagirkar e.

# Rojavayê Kurdistanê di bin beraşê çend pirskirêkan






**N:Jêhat**

Di demekê de ku ev pitir ji 10 salane piştî şoreşa xelkê welatê Sûriyê bi dijî rejîma dîktatore beşar Esed, rewşa rojavayê Kurdistanê heya niha jî bi awayê dufakto maye û zelal nine kanê şiklê qeware, sitato, çarenivîsa netewî, îdare û birêveberî çiye û çavane!

Li wê derheqê de gelek pirsyar têne pêş weke: Kê, çi, sedem, bûne hegera wê yekê ku rewş û çarenivîsa gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê her wisa bi lêl û nezelalî bimîne û ev derfetên zêrîn ku li wê perça Kurdistanê hatibûne pêş ku Kurd bibin bi dewlet, hemî ji dest biçin?

Bê guman ji nêrîna mirovê netewiye Kurd û dilsozên doza berheqe Kurdistanê ve bersiv gelek zelal xûyaye ku ev jî xwe rexnekirina part û aliyên siyasiye kurd li Rojavayê Kurdistanê ye ku mixabin piştî derbasbûna derfetên baş, nekarîn yekitî û yekrêziyekê di nava xwe de çê bikin û mala Kurd li hember pîlanrêjiya dijminan de bikne yek.

Mixabin bi sedema nebûna yekitiya aliyên Kurdî, dijminan jî ev yeka bi derfet zanîn û dest xistine nava kar û siyaset û helwestên wan ku bê guman pîlanrêjiya diminan kariye bandorekî rasterast dabinê ser peywendiya aliyên siyasiye Kurd li Rojavayê Kurdistanê û wan bi ser çendîn bere yan parve bike û nehêlin ji hevdu nêzîk bibin.

Tevlîheviyekî mezin li rewşa siyasiye Rojavayê Kurdistanê de heye ku hinek caran ger mirov lê difikre serî ji mirov gêj dibe û hêz û part û aliyên siyasî û birêveberiya Rojava heya niha nekarîne têkilî û peywendiyekî stratêjîk li ser bingeha berjewendiya netewî digel hêz û welatên elaqedar û testêverder li Sûriyê û nawçe û cîhanê de çêbikin, mixabin peywendiya wan li ser taktîka rojê ye û bo dirêjheyam û stratêjîk nine.

**Part û aliyên Kurd ku heçî kîjan bi awayê belawela û bi tena serê xwe û bona berjewendiya taybet bi partiya xwe tevdigerin, ne tenê nekarîne ji hevdu têbigehin û lihevkirinekê çêbikin û bi hevre bixebitin û li pêxema çareseriya mafê gelê Kurd de pêngavan bihavêjin, mixabin belkî nerastevxwe bi ser dijmin û rejîmên dagîrker de parvebûne û heçî kîjan ji wan hevdu sûçdar dikin ku kîjan alî di bin bandora Tirkiye, Îran, Sûriye û Îraqê dane û bo her kes û welatekê kar dikin tenê box we û netewa xwe nebe.**

Tevlîheviyekî mezin li rewşa siyasiye Rojavayê Kurdistanê de heye ku hinek caran ger mirov lê difikre serî ji mirov gêj dibe û hêz û part û aliyên siyasî û birêveberiya Rojava heya niha nekarîne têkilî û peywendiyekî stratêjîk li ser bingeha berjewendiya netewî digel hêz û welatên elaqedar û testêverder li Sûriyê û nawçe û cîhanê de çêbikin, mixabin peywendiya wan li ser taktîka rojê ye û bo dirêjheyam û stratêjîk nine.

Hêzên Kurdî bi awayekî paradoksdar li gel Hêzên hevalbendiya navnetewî bi serokatiya Amerîka, rastewxwe bi Amerîka re, bi Rûsiyê re, bi Îran û hin caran bi rejîma Beşar Esed re, parek ji hêza Kurd têkilî bi Tirk û Îraqê re û ….. peywendî hende û berjewendiya wan hemî welat û aliyan jî dijberî heve, ku wisaye mixabin Kur bûye kartekî qurbanî di nava lîstika navnetewî û iqlîmî de û dikarin digel her kesî re alîkarî û kar bikin, tenê hebxwe amade ninin digel hevdu kar bikin bo yêkalîkirina doza Kurd li wê perça Kurdistanê.

Partiyên siyasî kevtine jê bandora deshilatên iqlîmî û bûne alîgirê rast, çep, û şerê parastina berjewendiya wan dikin û mixabin li wê derheqê de nirx û xwînekî mezin dane, cengawerên Kurd, keç û kurên xwedî heste Kurd, çima dibe ji bona parastina nawçe û bajarên xeyrî Kurd şerê Daeşê bikin? Gelo kîjan taky an hêz û aliyekî Ereb yan Tirk û Fars xema Kurd û Kurdistanê de ye û gotinekî xêrê ji devê wan derdikeve?

Gelo çima Kurd di xema her kes û neteweyekê de ne, û tenê xema xwe û axa xwe û berjewendiya xwe de ninin? Gelo çima dive rondikên Kurdan ji boy Felestîn û Xezê birêjin û xema wan mafê dewletbûna Felestînê ye, di demekê de çu hebxwe ji Felestînê bê maftirin? Çima dibe Kurd nebne yek û nebêjin çima me dewlet çinîne? Gelo ma Rojavayê Kurdistanê û gelê me rojane weke Xezê ji aliyê dijminên Kurdan ve nayê bombebarankirin? Ma xwîna Zarokên Xezê ji xwîna Zarokên SereKaniyê, Efrînê û Kobanê Sortire?

Gelo ger sexmeratî piştewaniya ji bisilmanbûnê hinek Kurd kevrê parêzvanî ji Xezê li sîngê xwe didin, ma Kurd ne bislmanin? Gelo ma Felistînî li ser bisilmanbûnê têne kuştin? Berê de gotine heya male here, mizgevtê betale, lewma heya Kurd hebxwe bê maf û blindest bin, heya dujmin axa Kurdistanê bê rehmane bombaran bike û zaroj û jinên Kurdan bikuje, heya em Kurd hebxwe nebne yek, her tiştekî din betale û gorî şerîet jî dilsozî bo xelkê dine, yekitî çêkirin digel xeyrî Kurdan, daxwaza dewletbûnê bo Felistîniyan yan her neteweyekî dine bo mêrkê Kurd hermae.

Emê wê demê bikarin serkevin ku destpêkê de her tiştî box we bixwazin, eva jî raste ku em dijî kes û neteweyekî din ninin û tenê dibê em bigehne wê astê hişmendiyê ku çiyê din rejîmên dagîrkerê Kurdistanê û dujminên me nekarin me bi kar bînin û bo evê ku em nekarin bigehne armancên netewiye xwe, bila hine me ji hevdu dûr neyxînin û bi dijî hev bikar neyinin.

Derdê me Kurdan bê dermane, û ger rojekê jî em şik bibin dermanek heye, bê guman ev derman cem me xweye ku yekitî û yekrêzî û hevxebatiye li pêxema berjewendiya bilinde neteweyî de.

# Bandora siyasî-civakiya Şoreşa "Jin Jiyan Azadî" li ser civaka Îranê



N: Hûmen Simko



**TEVGERÊN KU PIŞTGIRIYA MAFÊN JINAN Û AZADIYA JINAN DIKIN, BANDOREKE ZÊDE Û GIRÎNG LI SER REFTARA REJÎMA ÎRANÊ LI HEMBER CIVAKÊ DE LÎSTINE.**

**Li wir çend sedemên vê bandorê hene:**

## 1- Hişariya civakî

Tevgerên jinan li derheq newekheviya zayendî û mafên jinan de hişyarî zêde kirin û vê yekê civak hişyartir û çavvekirîtir bi dîtina rastiyan kir. Li rojên ku rejîma Îranê hate ser kar, ji destpêka sala 1357 a Rojî, heta berî şoreşa "Jîna"yê, bi darê zorê û bi rêkarên nemirovane hewl da ku jinan li civakê de kontrol bike. Jin bona rizgarbûna ji hizrên mêrsalarî(Masculism) yên Îslamî û mercên giran ên hicaba bi zorê kevtine nav xirabtirîn rewş û mercan, ji aliyê dezgehên birêveberî yên rejîma Îslamî ve rastî bêrêziyên nemirovane û îşkenceyan hatine û mafên wan ên bingehîn ên mirovî, li civaka Îranê hatiye binpêkirin.

## 2- Lêkolînên navnetewî

Pirsgirêkên mafên jinan gelek caran bala navneteweyî bo aliyê xwe radikêşîne û bo çareserkirina pirsgirêkên mafên mirovan û wekheviya zayendî li ser asta cîhanê givaşê dixe ser rejîma Îranê. Bi vê sedemê ku li cîhana Rojavayî de û li destpêka sedsala 19an de mafên jinan wek yek ji mijarên micid û girîng li civaka wê demê de hate pejirandin ku pêşkeftina civakê girêdayî pêgeha rast û yasayî ya jinê ye. bo vê yekê jî nêrîna wan welatên demokrat li ser şoreşa niha ya "Jîna Emînî" li Îranê, bi hemû hêza xwe bi şêweyên cuda piştevaniya gelên Îranê kirine û hevdengê wan bûne û li dijî vê rejîma gendel sekinîne û li hemû cîhanê de li ser şeqaman piştgiriya xwe ragihandine. Lewma yek ji fakterên herî bibandor û bingehîn bo givaşxstina herî zêde li ser rejîma Îranê her ev piştevaniya hemaheng û bi rêxistinkirî ya van welatan li asta navnetewî, li tevgera şoreşvaniya xelkê Îranê bû.

## 3-Bihêzkirin û cemawerîkirinê bi taybet a jinan li şoreşa "Jîna"yê

Jinên ku bi awayekî çalak beşdarî li tevgerên ji bo mafên xwe dibin, bûne hêzeke mezin ku li dijî rol û pîvanên zayendî yên kevneperestî derdikeve pêş. Wê hêzê bandor li ser nêrîn û hêviyên civakî jî kiriye. Yekitiya jinan li Îranê de li reftara digel rêkxistina "Emir bi Marûf û Nehî ez Munker" û rêxistinên besîciyan ên ser bi rejîma Îslamî li civakê de bûye sedema paşvekêşandin û tirsa berpirsên rejîmê ji vê yekrêzî û pêkvejiyana jinan. Jinên ku ji despêka şoreşa gelan li Îranê heta niha bi dijwartirîûn rewşê bûne qurbaniyên bihayên zayendiyên yên "Masculism" û pîvanên kevneperstî û hertim rastî nedadpewerî û binpêkirina mafên xwe yên bingehîn hatine, lê êdî niha ji hizrînê mêrsalarî yên Îslamî natirsin.

## 4- Guherîna hizra giştî

Çalakiya jinan alîkarî da guherina hizra giştî li hundirê Îranê, bi awayek ku xelkek zêdetir piştgirîya wekheviya zayendî û mafên jinan bikin. Yek ji bandorên herî girîng li şoreşa "Jîna Emînî" de, guherin û veguherina hizra giştî ya civakê li derheq mafên bajarwendî yên jinan weke pêkhînerê nîveya civakê bi rengekî erênî û stratejîk li xwe girt. Li şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" de mêr jî li gel jinan rijyane ser şeqaman û daxwaza guherina siyasetên dijejin li civaka Îranê de kirin û li vê rêyê de xwîna gelek ji ciwanên azadîxwaz bi vî awayî hate rijandin.

## 5 - Beşdariya ciwanan

Gelek ji ciwanên xelkê Îranê bi awayekî çalak piştgirîya mafên jinan dikin, û heşîmeta ciwan, ku beşeke herî girîng a heşîmeta Îranê ye li guherîna hizra civakî de bo guherina civakê li pirs û rolên zayendî de alîkariyê dike.

Li halekê de ku berteknîşandana rejîma Îranê ên wek serkut û reformên biçûk û sînordar li hember van tevgeran dikare cuda be, hewlên parêzerên mafên jinan li ser qewaredan bi gotar û bandorxistin bo ser dînamîkên civakî li Îranê berdewam in.

Ciwanên ku azadiya gotin, raman, wekheviya zayendî û pêşketina civakê girêdayî bi azadiya jinê li civakê de dihesibînin ku ji ramanên rejîma Îslamî yên qirêj xilas bibin, mil bi milê jinan li civakê de rijyane ser şeqaman û mil bi mil bi wan re digel rejîma Îranê şer kirin.

Yekitiya jin û mêran şûndanîn û karlêkeriyeke gelek micid li ser siyasetên cudaxwaz ên rejîmê li rûbirûbûn digel vê şoreşê de bi cî hişt. Teror û sama ku rejîm hertim jê direviya û bi siyasetên cudatîdanînê zayendî hewl dida li bêdengî û li jêr perdeyan bifetisîne, niha li şeqamên Îranê, şerê wê dike.

Tevgerên jinan herwisa bandor li ser axaftinên siyasî kirine û bo çaksazî û reformên yasayî û guherinên siyasî yên ku bingeha zayendî berçav digrin hewlê dide.

# Hunermend û pêşmergê berê yê Hizba Demokrat “Tahir Xelîlî” koça dawiyê kir

Hunermendê navdar û pêşmergê berê yê Hizba Demokrat “Tahir Xelîlî”, li bajarê Silêmaniyê de koça dawiyê kir.

Hunermend Tahir Xelîlî, sala 1335 a Rojî, li bajarê Bokanê, ji dayîk bû. Wî ji zarokatiya xwe de hez ji mûzîk û strangotinê dikir û li zû de li kor û kombûnan de dest bi strandina stranên hunermendên mezin ên wek “Mihemed Mamilê, Hesen Zîrek, Tahir Tofîq, Elî Merdan û Salih Dîlan” kir.

Hêj temenê wî 15 sal bû ku yekem berhema huneriya xwe belav kir û piştre bû xwediyê rê û şêwaza huneriya taybet bi xwe û hejmarek sirûd û stranên bi navûdeng li jiyana huneriya xwe de tomar kirin.


Hunermend “Tahir Xelîlî, sala 1358 a Rojî û piştî destpêkirina xebata aşkira ya teşkîlatî û siyasiya Hizba Demokrat, tevlî refên Hizba Demokrat bû û çi li çeperên pêşmergetiyê û çi li korên hunerî yên Hizbê de, heyama 5 salan xebata siyasî û huneriya xwe berdeewam kir.

Her li vê qonaxa jiyana siyasî û huneriya xwe de û piştî operasiyoneke hêza Beyan li gundê “Erbenûs”ê ku bi xwe jî li wî şerî de beşdar bû, sirûda dîrokiya “Le Terexeyî Serberze we” strand ku li tomarkirinên piştre, navê vê staranê bo “Qendîlî Serberz” guherî.

Hunermend Tahir Xelîlî li qonaxeke din a jiyana xwe de û li sala 1372 a Rojî, piştî givaşên navendên ewlehî yên rejîma Îranê, neçar ma ku ji Rojhilatê Kurdistanê derkeve û xwe gihande refên Hizba Demokrat û heta sala 1376 a Rojî ku ji welat derkevt, li kora Huneriya Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê de erkê hunerî û pêşmergetiyê bi rê ve bir.

Hunermend “Tahir Xelîlî” li salên derbasbûyî de jî ji derveyî welat dihate Başûrê Kurdistanê, li çendîn boneyên Hizbî de bi awayekî çalak, beşdar bû ku li 30emîn salvegera terorkirina Şehîd “Dr. Qasimlo”, çend sirûdên netewî û hemasî strandin.

Hunermend Tahir Xelîlî, xwediyê 10an sirûd û stranên bi navûdeng bû, ên wek “Kakî Şiwan, Xasekew, Şewî tarîk û bêdengî, Gulî Mehabad, Kîjûley Kurdistan” û çendîn sirûd û starnên bi nav û deng ên din. Mixabin koça dawiya wî, derfet neda ku zêdetir xizmeta hunerî bi gel û nîştimana xwe bike û li temenê 67 saliyê de koça dawiyê kir.



Em bi navê Rojnameya Agirî û Navenda Ragihandina Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, bi boneya koça dawiya ya hunermend Tahir Xelîlî, sersaxiyê dibêje malbat û kesûkarên wî û xwe li vê xema giran de bi hevparê xema wan dizane.

## XELKÊ KURDİSTANÊ EMEGDARE Bİ HUNERMENDÊN XWE

Roja 5ê meha sermawezê hunermendê şoreşvan Tahir Xelîlî, koça dawî kir, her di yekemîn demjimêrên piştî koça dawiya wî hunermendî, pêlekî berfirehe hevxemî û kovaniya xelkê her çwar perçên Kurdistanê hate xûyakirin, bi taybetî post û storî û kamênt û pirofaîlên torên civakî tejî bûn ji sitran û wêneyên hunermen Tahir Xelîlî.
Hekî gotî mirin emrê Xudê ye û renge gelek hunermendên dinê jî miribin ku dengê wan ji dengê kak Tahir xweştir be û çendîn beramberî kak Tahir zêdetir jî berhemên hunerî hebin, lê hevxemî û dengvedana koça dawiya wan bi qasî pêla berfirehe hevxemî û dengvedana koça dawiya Tahir Xelîlî nebe.
Ewa ku Tahir Xelîlî û cuda dike û bi wî awayê bêmînak û berfireh em hevxemiya xelkê niştîmanperwere herçwar perçên Kurdistanê û part û aliyên siyasî û sazî û rêkxistinan dibînin, renge vegere bo ser ked û zehmet û nirx û xebata kak Tahir li kincê pîroze Pêşmergayetiyê.
Hunermend Tahir Xelîlî, cuda li vê yekê ku dengekî xweş û zelal û çiyayî hebû ku bandorekî zaf dadina ser guhdarên xwe, û bi dehan berhemên huneriye wek sirûd û sitranên şoreşvanî çêkirin û bi taybetî Sirûda wî a hemasiye “Li Qendîlî Serberze we” bêtir bû sedemê hogiriya xelkê Kurdistanê û mirovên şoreşvan, bi kak Tahir, cuda ji wê hindê jî hunermend Tahir Xelîlî bo naveroka sirûdên xwe yên şoreşvanî û li pêxema bi destveanîna maf û azadiya netewî, hebxwe jî bibû Pêşmerge û piraniya temenê xwe dana bo xizmet bi doza berheqe gel, lewra wê yekê hinde dinê zêdetir kak Tahir bal xelkê Kurdistanê kire xoştewî û nav û dengê wî û sirûdên wî bo her kesî nasiyar bûn.
Ev Huner û xizmetên wî hunermendê şoreşvan bûn ku me dît piştî evê ku koça dawî kir, xelkê bi emege Kurdistanê û kesayetî û nûner û şandên part û aliyên siyasî li herçwar perçên Kurdistanê, çavan bi girseyekî mezin li merasima xaksiparî û serxweşiya wî de beşdar û hevxem bûn.
Dema ku Tahir Xelîlî di sirûda xwe a li Qendîlî Serberze we de dibêje “ Riya Qazî qet bernedin, hevalê xwe yê şehîd ji bîr nekin” peyamekê dide ku banga şoreş û xebatê ye, û dema xwe emegdarê rêbaza Qazî dizane, hawara banghêjiya emegdariya xelkê Kurdistanê jî dike bo wê rêbazê, her lewmaye ku xelkê kurdistanê ku hertim emegdarê rêke û rêbaşa şehîdên xwe ye, li ser wê bingehê ev gotina



kak Tahir dibe banga ber guhê her xortekî kurd û şoreşvanekê û dibe sedemê emegdariya wan bi xudî kak Tahir û xebat û emegdariya wî bi rêbaza qazî û pêşmergayetiya kak Tahir.
Me dît ku zêdebarî zext û givaş û rewşa tund û tepeserkaraneye rejîmê li rojhilatê Kurdistanê de, roja piştî koça dawiya wî hunermedndê netewî, çawan komek ji kesayetî û hunermend li devra hevdu kom bûn û bo rêzgirtin û bilind nirxandina yadê Tahir Xelîlî, bi awayekî şoreşvanî, piştî demekê bi bê dengî rawestan bo rêzgirtin ji şehîdên Kurdistanê, bi hevre sirûda “Li Qendîlê serberzewe” jî gotin, û bi wî awyî dikarim bêjim bi nûneratiya dengê hemî xelkê Kurdistanê, wan hunermendan li bajarê Serdeştê de, emegdariya xwe bi Kak Tahir û rêbaza xebata wî dane xûyakirin.
Rejîma dîktatore Îranê jî bi armanca tolhildan ji wê hesta wan hunermendan û şikandina wan, ev girtin û bi gef û zorê sirûda rejîmê bi wan dane gotin ku bê guman ev pîlana rejîmê jî, nîşana lewazî û bêşiyana wê ye û li pîlana xwe de serkevtî nebû û ev karê qirêje rejîmê, ne tenê nekarî kesayetiya wan hunermendan bişkêne, belkî hinde din ev kirne xoşvanê gelê Kurd.
Silv li riha nemir Kak Tahir Xelîlî û yad û nav û hunera wî hertim li cem gelê wî zindiye.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Li heyama 8 mehan de rejîma Îranê 16 kolber li sînorê Banê kuştine




Rêkxirava mafê Mirovê ya "Hengaw"ê raporek li ser amara kuştina Kolberan li sînorê Banê ji aliyê rejîma Îranê ve li heyama 8 mehên derbasbûyî de tomar kiriye û pêka vê amarê, 16 kes li sînorê Banê, hatine kuştin.
Li beşeke rapora "Hengaw"ê de hatiye: "Rejîma Îranê li heyama 8 meh û 4 rojên derbasbûyî anku 250 rojan de li sînorê "Banê", 16 kolber kuştine ku yek ji wan zarokekî temen 17 salî yê bi navê "Farûq Elîzade" ye û herwisa li heyama 70 rojên derbasbûyî anku ji destpêka demsala Payêza îsal ve, 82 kolber bi teqeya rasterast ji aliyê rejîma Îranê ve hatine birînîndarkirin.
Pêka vê raporê, fermandeyê hêzên çekdar ên rejîmê li sînorê Banê "Mehdî Wahidî" û cihgirê wî yê bi navê "Mistefa Muradî" li teqekirin û kuştina kolberan de rola bingehîn hebûne.
Herwisa "Hengaw"ê nasnameya 16 kesên ku li sînorê Banê de ji aliyê hêzên hov û dije mirov ên rejîma Îranê ve hatine kuştinê, belav kiriye ku piraniya temenê wan li navbera 17 heta 26 salî ne.
Pêka vê amarê, rejîma Îranê bi teqeya rasterast ew kolberane kirin e armanc û kuştine û bilî çeka kilaşînkof, çekên wek "RPG" û çekên nîvegiran jî bikar anîne.

## Yekîtiya Ewropayê: " amara bidarvekirinan li Îranê gelek bi sam e"



Yekîtiya Ewropayê bi belavkirina daxuyaniyekê, lezgîniya bidarvekirinan li Îranê, gelek bi sam binav kir û daxwaza sekinandina cezaya bidarvekirinê kir.
Yekîtiya Ewropayê bi belavkirina daxuyaniyekê, tevî îşarekirin bi bidarvekirina "Hemîdriza Azerî" yê temen 17 salî û "Mîlad Zohrêwend" ê binçavkiriyê xwenîşandana seranserî li Îranê ragihandiye: "lezgîniya niha ya bidarvekirinan li Îranê ku ji destpêka sala zayînî ve 600 halet bûne, gelek bi sam e".
Dosyeya "Hemîdriza Azerî" li temenê 16 saliya wî de hatiye çêkirin û li temenê 17 saliyê de jî hatiye bidarvekirin û "Mîlad Zohrêwend" bi bê hebûna parêzer û bê hevdîtina cara dawî digel malbata wî, bi bandor û li jêr givaşên spaha pasdaran a terorîst, li girtîgeha rejîmê li bajarê Hemedanê de hatiye bidarvekirin.
Yekîtiya Ewropayê li daxiyaniya xwe de tekezî li ser dijayetiya xwe ya pêka yasayan û micidî li hember bikaranîna cezaya bidarvekirinê li her dem û li her rewşekê de kiriye.
Herwisa li vê daxuyaniyê de îşare bi mafê zarokan pêka xalên konvansiyona cîhanî ya mafê zarokan hatiye kirin.
Berê jî Saziya Mafê Mirovî ya Netewên Yekgirtî, bidarvekirina çalakvanên siyasî û azadiya gotinê û rênedan bo lidarxistina kombûnên nerizayetiyê ji aliyê rejîma Îranê ve şermezar kiribû.

## Du mamosteyên olî li bajarê Bokanê ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîmê ve hatine girtin



Roja Şemî 11ê Sermawezê, mamoste Hesen Emînî pêşnimêjê mizgefta Melaler, yê ser bi bajarê Bokanê û mamoste Mihyedîn Mihemedzade pêşnimêjê mizgefta Newbar yê ser bi bajarê Bokanê ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîmê ve hatine girtin. Li gorî Ajansa Nûçegihaniya Mafê Mirove Kurdpayê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ev du mamosteyên Olî girtine.

Herwisa Kurdpayê ragehand, lipeykeftinên malbata wan du mamosteyan bo agehdarbûn ji çarenivîsa wan bê encam maye.

Mamoste Hesen Emînî, xelkê gundê Merxûz yê ser bi bajarê Seqizê û Mamoste Mihyedîn Mihemedzade xelkê gundê Kenollan yê ser bi bajarê Seqizê ye.

Mamoste Mihyedîn Mihemedzade, berê pêşnimêjê mizgefta gundê Kolle yê ser bi bajarê Dîwanderê bûye û roja 20ê Befranbara sala 1393an bi hukmê Navenda Mezina Îslamî, li pêşnimêjiyê hate dûrxistin û di wî gundî de hate derxistin
Heya dema belavbûna vê nûçeyê sedema girtin û tohmetên ku bi ser wan du mamosteyên Olî de hatinî sepandin ti zaniyariyek ber dest de nîne.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (459)

